# DÎHNÊN XWEZAYÊ YÊN HEEBUNÊ

# -4-

«welat, ez, śexsiyet, zman»

## Welat, ciyê/źîngeha ku meriv lê diźî, «serpêhatî/serborî» u «tecrube»yên xwa bi navbera orxenên xwa yên sehî[1] wekî înformesiyon u bîranîn[2] di hiśê xwa da tomar dike, ye.

(24.09.2012, 18:04, Zürich / Swîsre)

Serekîn/prîmer bi «serpêhatî» u «tecrube»yên bi demên zaroktî u ciwantiyê va girêdayî ye. Di nav van herdu pêvaźoyan da sîstema biyoloźîk u psîxoloźîk ya însanan [źîndaran] źi hemî hêlan va bingeha xwa ya daîmî ava dike. «Serpêhatî» u «tecrube»yên ku paśê di nav pêvaźoya źiyanê ra tên kirin źî, li ser vê bingeha «pêkhatî» ya dema zaroktî u ciwantiyê têne pît kirin.

Bêguman «tecrube» bi xwa digel ćêbuna «serpêhatî»yan paralel pê ra u dura tên kirin. Yanî «tecrube» encameke xwezayî ya «serpêhatî»yan e.

Ev hemî «serpêhatî» u «tecrube»yên ku meriv yek bi yek di nav źîngeha [welatê/milletê] xwa da dike u wan di mêźiyê xwa da tomar dike, dibin sebeb ku pê ra «ez» u «śexsiyet»a meriv ya ferdî[3] bihafire.

Loma źî ev hemî heebunên ku di nav vê źîngehê da bi navbera van «serpêhatî» u «tecrube»yan bandoreke bingehîn l' ser hiśê meriv dikin, meriv wan wekî «resim» u «deng» [«zman»] di mêźiyê xwa da tomar dike. Li ba însanan bi zêdeyî seha «dîtin» u «zmên/dêng» desthilatdar in, digel tomarkirina înformesiyonên bi serpêhatî u tecrubeyan «resim», lê digel ragiyandinê źî «zman» [deng] pergala sereke ya biyoloźîk e źibo însanan [źîndaran]. Helbet ev źî dibe sebeb ku ev «serpêhatî» u «tecrube»yên kirî, paśê bi aktîvkirina seha «dîtin» [resim] u «zmên/dêng» wekî bîranîn werin bi kar hanîn. Mesela gava meriv berbi baźar, gund, kolan, mal, bexće, kanî, dibistan yan źî daristana xwa va terre, hingê meriv di raśtiyê da berbi «serpêhatî» u «tecrube»yên xwa yên derbaz buyî va terre, ango ew «serpêhatî» u «tecrube» bi navbera wan «resim» u «deng»an wekî «bîranîn» di hiśê wî kesî da xwa didin der.

Ev yek źî dibe sebeb ku di navbera wî merivî u wî gundî/baźarî ... da aîdiyek u girêdayineke pirrhêlî, pirrengînî u hîssî ćêbibe. Di rewśeke hilo da meriv him heebuna xwa ya śexsî bi wan tiśtan u him źî heebuna wan tiśtan ligorî bîranînên xwa rave dike.

Źiber vê yekê ye ku di nav xwezayê da «raman u tevgerra obźektîv» tun e u nikare hee bibe źî. Peźirandina «obźektîvî»yê, reddkirina «subźektîvî»yê ye, ango redda hêman u prensîbên ku xwezayê pêktînin, e.

Digel vê yekê «zman» aleta herî esasî ya her śexsî ye u derfeta ku meriv bikare van «serpêhatî» u «tecrube»yan źi tomardankên mêźiyê xwa b'îne der, wekî înformesiyon bi kesên din ra parve bike, dide. Źê pê va hindî dan u girtina înformesiyonan derfeta ku meriv bikare źi «serpêhatî» u «tecrube»yên hevdu sudê

---

[1] 11 sehên ku ez dixwazim li vir bidim, ev in: «dîtin, bihîstin, bêhn, tam/ćêź, dang/parseng, pêlêkirin, tevgerr, germayî, êś, zman/deng, dem/wext».
Ligorî hindek nêrînan 13 seh hee ne.
Bêguman li vir daynîna sînoreke pît, gelekî zor e. Dibe ku hîn gelek «sehên» heeyî bi tevî metodên empîrîk werin pesend kirin.

[2] «Bîranîn» bixwa di bîra meriv da teśeyên «înformesiyon»ên tomarkirî ne.

[3] U pê ra źî ya netewî.

werbigire, derdixîne holê. Loma źî ev aleta [zmanê] ku di navbera śexsan da têgêśtineke bingehîn ćêdike, di nav komekê [welatekî/milletekî] da dibe sebeba śîfreya dîroka buhurî u girêdayîna bi hev ra ya «heebe-nebe».

Bêguman bi mirina zmên ew kom źî dimire. Înformesiyonên ku wekî «resim» u «deng» di mêźiyê takekesên wê komê da hatî bunn tomar kirin źî, bi navbera «zman»ê kuźer yê koma desthilatdar źi nu va tên formule kirin u bi kar anîn.

- Kurd, bi zmanê kurdî buyîbunn kurd!
- Kurd, bi zmanê kurdî kurd bunn!
- Kurd, bi zmanê kurdî kurd in!
- Kurd, bi zmanê kurdî źî ewdê kurd bimînin!

Lê mixabin,

- Kurd, ewdê bi mirina zmanê kurdî źî bimirin u herrin!

Źiber van hegerên bingehîn u zerurî ne ku di nav komekê [welatekî, milletekî] da heebuna wê komê tip u tenê li ser encamên «serpêhatî» u «tecrube»yên śexsekî ava kirin yan źî orxenîze kirin, zu yan źî dereng bi xwa ra źihevketin u tunebuna wê komê tîne. Ćiku ev ne birryareke obźektîv ya xwezayî u biyoloźîk e, lê yeke subźektîv e u li diźî prensîbên xwezayê yên heebunê ye. Di nav komê da heebuna tevgerrîneke «totelîter» rê li ber encamên bi sud yên «serpêhatî» u «tecrube»yên din digire, bernade ku ew «serpêhatî» u «tecrube»yên din źibo menfeetên komê yên daîmî produktîv werin bi kar hanîn.

Źiber vê hindê ye ku di nav komekê [welatekî, milletekî] da heebuna hevahengiya pirrdengînî u pirrrengîniyê têgêśtinek u tevgerrîneke tekez e.

- Kurdistan, bi zmanê kurdî buyîbu Kurdistan!
- Kurdistan, bi zmanê kurdî Kurdistan bu!
- Kurdistan, bi zmanê kurdî Kurdistan e!
- Kurdistan, bi zmanê kurdî ewdê Kurdistan bimîne!

Lê mixabin,

- Kurdistan, ewdê bi mirina zmanê kurdî źî bibe Tirk-, Ereb- u Farsistan!